Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :956 13 -Nîsan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

## "Rewşa aborî û siyasî bandorê li qirêjiya xwezayê jî dike"

**Bihar demsala ciwanî û xweşiktiya xwezayê ye, bi destpêkirina biharê re geşt û festîfal tên lidarxistin lê aliyên berpirsyar di asta pêwîst de girîngiyê nadin paqijiya xwezayê.**

Bi hatina demsala biharê re geşt dest pê dikin û festîfal tên lidarxistin. Bihar bi xwezaya xwe ya ciwan wêneyek xweşik derdixe, lê geştiyar derdorê qirêj dikin û bê ku paqij bikin ji cihê ku lêne derdikevin û diçin. Dema em temaşeyî wêneyê piştî geşt, seyran û festîfalan dikin em dibînin ku li gorî pêwîste xweza paqij nayê girtin û geştiyar xwe weke berpirsyarê xweza û şinatiyê nabînin û xwezayê qirêj dikin. Ajansa me berê xwe da cihê festîfala Elî Beg Caf ku di 1'ê Nîsanê de li gundê Baxan ê girêdayî Qeredaxê hatî li darxistin. Bi hezaran dolar li vê festîfalê hat xerckirin, lê ew pere piştî festîfalê ji bo paqijiyê bi kar nehat. Piştî heftiyek li ser festîfalê re derbaz bû, xwezaya herêmê weke çopê lê hat û gelek ziyan giha xwezayê.
Endama desteya festîfalê Hebîb Mehemed Caf di derbarê aliyên paqijiyê ya festîfalê de ji ajansa me re axivî û diyar kir ku salên borî piştî festîfalê di demek kin de dihat paqijkirin û got: "Îsal şaredariya Qerdax gotin ku ger hinek pare bidin wan wê bi xwe paqij bikin û nêzî milyonek û 200 hezran girtin, mixabin şaredarî gotibû emê bi xwe paqij bikin û heta niha jî paqij nekirin. Di salên bûrî de kampanya erkê paqijiyê girtin ser milê xwe û di rojekê de bi temamî paqij dikirin, mixabin îsale karê xwe xistiye destê hikumetê û karê xwe ji bi başî rêve nedibir."

### "Sedema sereke ya qirêjiya xwezayê mirov e"

Mamostaya zanîngehê û pispora xwezayê Rojan Ferîdûn jî bi bîrxist ku sedemê destpêkê yê qirêjbûna xwezayê mirove û wiha domand: "Sedemê sereke yê qirêjbûna xwezayê mirove, ji ber roj pey rojan tewanê wana zêdetir dibe, mirov dikare bêje ji ber hêjmara zêde ya mirovan li ser zeviyan xweza û şînatî qirêjtir dibe. Hem û qirêjî bandorek neyênî çêdike û niha bandorek zêdetir çêdike û şiyariya hemwaltiyên me kême. Madeyên pilastîk piraniya wê madeyên



jehrawîne li ser ruyê erdê ziyanê dide zindiyên ser ruyê erdê. Ne şerte dema diçî geştê û seyranê madeyên pilastîk li gel xwe bibe dikarin şuşe li gel xwe bibin, şiyariya kesan kême û bepirsyartiya xwe ya beramberî xwezayê pêknayne. Sedemê vê jî hebûna rewşa siyasî û aborî ya niha li herêma Kurdistanê ku xelk baş nêzî xwezayê nabe. Parastina xwezayê dû aliyên xwe hene, beşek taybete ji bo hemwelatiyan beşa dinê jî dikeve ser milê hikumetê û aliyên peywendîdar. Ji ber hinek hemwelatiyên şiyar hene û piştî xwe kom dikin û hikumet jî pêwîste erkê ku dikeve li ser milê wan pêk bîne û ji vê rewşê re çareseriyekê bibîne."
*JINHA*

## Peyam bi destrengîniya xwe hunerên xweşik derdixe

**Peyam Hesen li ser nexweşiya xwe nehizire destrengîniya xwe ya hunerî pêş dixe û gelek berhemên xweşik bi destan çêkirine.**


Peyam Hesen a 25 salî ji ber nexweşiya dil û nefestengî nekarî xwendina xwe dewam bike. Nexweşiya tu caran ew bê hêvî nekir û bi destrengîniya xwe dest bi karê dest kir. Beriya dest bi karê dest bike hertim ji bo tedawiyê diçû Hindistanê, da ku rojên xwe derbaz bike dest bi çêkirina karê dest kir û heta niha berdewam dike.
Peyam Hesen di derbarê karê xwe de got: "Ger tendirustiya min baş bibe dikarim hîn zêdetir kar bikim. Dema ku li Kelarê pêşangeh tê vekirin ez jî karê destê xwe li wêderê nîşan didim."
*JINNEWS*



## Dêwên Dambo yên xwezayê diparêzin

**Thomas Dambo peykersazekî Danmarkî ye. Lê peykerên wî ne li pêşangehan tên nîşandan, ew daristanê weke studyoyekê bi kar tîne.**

Thomas Dambo peykersazekî Danmarkî ye. Lê peykerên wî ne li pêşangehan tên nîşandan, ew daristanê weke studyoyekê bi kar tîne.
Malzemeyên wî jî, malzemeyên xwezayî yên hatine avêtin in. Ew ji dar û keviran peykerên mezin çêdike. Ev peykerên wî weke dêwan tên xuyanê, lê mirov ji van dêwan natirse. Dambo wan bi awayekî sempatîk çêdike û ev dêwên wî yên li daristanan ji xwe re dilîzin.
Kesên ku diçin serdana van dêwên Dambo ji dêvla ji wan bitirisin, bêhtir ji wan hez dikin. Piştî li daristanan dar tên birrînê, gelek darên mayî li daristanê bê xwedî dimînin û nayên bikaranîn. Dambo van daran dike malzemeyê hunerê xwe. Dambo ji bo van tiştên avêtî re dibêje, "Ez tiştên avêtî (çopên wan) yên xelkê ji nûve bi kar tînim."
Dêwên Dambo, xwezayê jî diparêzin. Dambo bi zanebûn wan wisa nîşan dide û hêvî dike kesên li xwezayê digerin jî xwezayê biparêzin û nehêlin xweza zirarê bibîne. Ew bi van dêwên mezin dixwaze empa- tiyekê ava bike bi mirovan re.
*Ozgûr Polîtîka*





## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Afirandin | Xuliqandin, peydakirin, çêkirin, sazkirin. |
| Afirîner | Xuliqkar, peydaker, jîr, jêhatî. |
| Arîşe | Pirsgirêk, kêşe, mesele, muşkîle, nexweşî, alozî... |
| Heman | Eynî, her ew kes/tiş: Ev her du heman tişt in. Di heman saetê de hat. |
| Hemin | Teqez, muheqeq: Hemin ezê biçim, lê dixwazim tu jî werî. |
| Hêman | Bingeh, hîm, binyad. |
| Havên | Tişta ku bi alîkariya wê, tişteke din çêdibe. Heyvan, mastê ji bo meyandina şîr, hevîrtirşik, tovê mêran. |
| Kêşe | Pirsgirêk, mesele, muşkîle, nexweşî, alozî... |
| Organîze (Fransî) | Rêxistin, tenzîm: Konferansek organîze kirin. |
| Tanker (Fransî) | Kamyon yan jî kêştiyên ji bo kişandina berhemên petrolê, avê û tiştên rohn. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | A | ■ | Ê | L | ■ | P | E | Z |
| 2 | ■ | D | Î | D | A | R | ■ | S | ■ |
| 3 | L | ■ | S | Î | ■ | E | B | A | D |
| 4 | Î | S | A | ■ | A | S | A | ■ | E |
| 5 | S | A | L | Î | S | E | ■ | T | ■ |
| 6 | ■ | R | ■ | Z | A | N | G | O | Ç |
| 7 | M | ■ | G | ■ | N | ■ | O | ■ | E |
| 8 | A | M | A | N | ■ | D | R | A | M |
| 9 | T | Î | ■ | A | A | ■ | E | W | K |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 2 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 3 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 4 | ■ | | | | ■ | | ■ | | ■ |
| 5 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 6 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 7 | | | ■ | | | | ■ | | ■ |
| 8 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 9 | | ■ | | | | | ■ | | |

### ÇEP-RAST

1. Ji wî/ji wê... Cureyekî xwînê... Genimê hêrandî
2. Teref... Temen
3. Hesinê ku li binê piyê hespan dixin... Pêxemberek
4. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin
5. Dewlata kurdan a herî mezin
6. Zimanê gelê Danîmarkayê
7. Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî... Cephe, bere
8. Kurdistan li ser kîjan parzemînê ye... Bêyom
9. Kinceke zivistanî ya stûr e û hetanî ser lingan dadikeve... Daçekek ku wateyê xurt dike

### JOR-JÊR

1. Lawaz... Beşeke malê, jûr
2. Eşîr, qebîle, hoz... Cure, celeb
3. Beşer, mirov... Rêxistina polîsan a naziyan
4. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê... Muxtar
5. Wekî gijbûna pirça canê ajelan û tiştên wisa... Nimûne
6. Rastêşek
7. Xweliya piştî şewatê... Hejmarek
8. Plakaya navneteweyî ya Sûriyeyê... Kanaleke televîzyona kurdî
9. Niyaza xêr û qenciyê... Dengdêrên "pêça"yê... Notayek



## `Dayîka Uweyş bi anîna dinyayê û perwerdekirina Rêber Apo dîrokeke nû vejand`

Fatima Ebdullah: Dayîka Uweyş fêrgeha yekê ya Rêberê Apo bû. Bi anîna dinyayê û perwerdekirina Rêbertiyê dîroka gelên bindest jinûve vejand. R-3

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 956 13-Nîsan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Ji jinên sînemavan yên Îranî biryara yekîtiyê

Li Îranê zêdeyî 300 jinên di qada sînemayê de kedê didin, li dijî tundiya zayendî belavoka hevpar imze kirin û biryar dan ku bi yekîtî tev bigerin.R-7



# ŞAMÊ QIBLEYA XWE ŞAŞ KIRIYE

**Şam ambargoya li ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê girantir dike.**

Digel ku bi pêşengiya Kurdan Sûriye ji nava pencên DAIŞ`ê hat rizgarkirin, hikumeta Sûriyê dijminiya Kurdan dike. Şam ketiye rewşeke wisa ku ne li pêş xwe dibîne, ne li paş xwe. Hikumeta Şamê li ser welatiyên taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ambargoyeke dijwar daniye. Li gel wê li lîsteya madeyên ambargokirî madeyên destpêkê ku dikevin çêkirina cilûberg û betariyan hatin zêdekirin. Bi vî awayî wê bi dehan kargeh û karkerên wan werin rawestandin.



## Prof Atmîş: Iraq ber bi rewşeke nediyar ve diçe û Tirkiye sûdê ji vê rewşê digire

Profesorê iraqî Dr. Sadiq Atmîş diyar kir ku Iraq ber bi rewşeke nediyar ve diçe û partiyên desthilatdar yên Iraqê çi Ereb û çi Kurd li berjewendiyên neteweyî nafikirin. Herwiha diyar kir ku Tirkiye ji rewşa Iraqê sûdê digire da ku armanca xwe pêk bîne. R-5



## Rêveberiya Xweser hêviya gelên Sûriyê ye

Rûken Ehmed: Rêveberiya Xweser projeyeke serkeftî ye. Gelên herêmê tev bi rêxistin kirin, mafê her kesî da û herêmê jî ji êrişan diparêze.R-4




Civak û welatê dînîtî lê ne serbest be, azadî jî lê ne serbest e!
Sîpan Şînda
R-7



Şerê hêzên serdest aştî û hekheviyê nayne.
Zekî Bedran
R-5



Aştîxwaziya durû ya Dolmabahçe!
Ahmet Aktaş
R-4




## `Tirkiye amadekariya êrişên nû dike`

Hevserokê Meclisa Leşkerî ya Herêma Cizîrê got, armanca dewleta tirkî ji zêdekirina êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê provokekirina hêzên leşkerî ye. Herwiha dixwaze tevgera xwe ya diplomatîk li derve bidomîne da qada dagîrkeriya xwe berfireh bike." R-2

## Li taxa Xezalî ya Hewlêrê destrengîniya Dilfîrozê

Dilfîroz li taxa Xezalî ya Hewlêrê destrengîniya xwe nîşan dide û ciwanên tên taxê eleqeyeke mezin nîşanî berhemên wê didin..R-7



# `Tirkiye amadekariya êrişên nû dike`

Hevserokê Meclisa Leşkerî ya Herêma Cizîrê got, armanca dewleta tirkî ji zêdekirina êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê provokekirina hêzên leşkerî ye. Herwiha dixwaze tevgera xwe ya diplomatîk li derve bidomîne da qada dagîrkeriya xwe berfireh bike."

Dewleta Tirkan ya dagirker û çeteyên wê ji 9`ê Cotmeha 2019`an ve, piştî dagirkirina herêmên Serêkaniyê û Girê Spî, êrişên xwe li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomînin. Rojane navçeyên Zirgan û Til Temirê yên girêdayî kantona Hesekê bi dijwarî topbaran dikin.
Di 4`ê vê Nîsanê de artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê navenda Hêzên Ewlekariya Hundirîn a li navçeya Zirganê, navenda navçeyê, gundewarên wê yên bakur û rojava topbaran kirin. Di encama topbaranê de 3 endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn birîndar bûn û ziyanên madî mezin gihaştin mal û milkên welatiyan.
Şeva pêncşemê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê careke din navçeya Zirganê da ber topan. Di encamê de 5 welatiyên ji gundê Esediyê yê bakurê navçeyê ku ji heman malbatê ne, birîndar bûn.
Di hefteya borî de dewleta Tirk a dagirker bi rêya balafirên bêmirov gelek herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bombebaran kirin û di encamê de welatî, berpirs û şervanên QSD`ê birîndar bûn. Di roja cejna Ekîto de bi balafireke bêmirov erebeyek li ser rêya Qamişlo –Tirbespiyê kir hedef. Di encamê de şervanekî Hêzên Erka Xweprastinê şehîd bûn, her wiha şervanekî din û helbestvan Ferhad Merdê birîndar bûn. Piştre jî endamekî Fermandariya Giştî ya Meclisa Leşkerî ya Suryan û wergervanê wê kir hedef
Li kêlek wê jî, dagirker Tirk stasyona kehrebeyê ya Til Temirê topbaran kir, di encamê de stasyon du rojan ji xizmetê derket û piştî wê gerînendetiya kehrebeyê stasyon sereast kir û ji nû ve kete xizmetê.
Têkildarî zêdebûna êrişên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li ser herêmê Hevserokê Meclisa Leşkerî ya Herêma Cizîrê Hisên Selmo ji ANHA`yê re axivî. Hisên diyar kir ku demên dawî êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li ser herêmê, nexasim li ser navçeyên Til Temir û Zirganê zêde bûne.
Hisên Selmo îşaret bi armanca dewleta Tirk ji van êrişan kir û got: "Armanca dewleta Tirk a dagirker ji van êrişan ew e ku şêniyên resen ji herêmên wan koçber bike, tevlihevî û tirsê di nava wan de belav bike ji bo herêmên din dagir bike. Bi van êrişan hewl dide hêzên me yên leşkerî şantaj bike û wan ber bi binpêkirina peymanên agirbestê ve bikişîne."
Selmo da zanîn ku dewleta Tirk a dagirker bi rêya zêdekirina êrişan û tevgera xwe ya diplomatîk nexasim piştî şerê Rûsya – Ukraynayê dixwaze derfeta berfirehkirina qada dagirkirina xwe werbigire û wiha pê de çû: "Tevgereke diplomatîk a mezin a dewleta Tirk heye da ku dagirkirina herêmên nû erê bike, qada dagirkirina xwe berfireh bike û herêmên dagirkirî di bin serweriya



xwe de bihêle."
Hevserokê Meclisa Leşkerî ya Herêma Cizîrê Hisên Selmo di dawiyê de got: "Hêzên me yên leşkerî amade ne bersiva çi êrişên li ser herêmê bide."
***ANHA***

## Rêveberiya Xweser dest bi projeya leckirina parçeyên laş kir

**Ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmê parçeyên laşên gelek zarokan hatin qutkirin. Ji ber wê Rêveberiya Xweser li herêma Firatê dest bi projeya leckirina parçeyên laşên zarokan kir.**





Di encama êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmê de, parçeyên laşên zarokên li herêma Firatê hatin qutkirin. Girêdayî mijarê, piştî lêkolîna Desteya Karûbarên Civakî ku ling û destên gelek zarokan hatine qutkirin, Rêveberiya Xweser dest bi projeya leckirina parçeyên laş kir.
Der barê vê yekê de cîgirê Hevserokatiya Desteya Karûbarên Civakî ya herêma Firatê Moro Hisên wiha got: "Ji ber êrişên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên bi çekên giran li ser herêmê, gelek welatiyan dest û lingên xwe ji dest dane di nav de zarok jî hene. Di encamê de me biryar da ku em ê alîkariya wan zarokan bikin da ku careke din tev bigerin û me projeya leckirina parçeyên laş da destpêkirin."
Hisên wiha domand: "Me destpêkê dest bi dermankirina(tevgerên) fîzîkî ji zarokê bi navê Ebdo Mistefa Henîfî re kir. Niha jî em amadekariya leckirina lingekî çêkirî piştî çend hefteyan dikin. Lingê Henîfî di encama topbarana dewleta Tirk a dagirker li dijî gundê Qeremox de di 9'ê Çileya îsal de hate qutkirin."
Projeya leckirina parçeyên laş li navena astengdaran a girêdayî Desteya Karûbarên Civakî li herêma Firatê, pêk tê.
Girêdayî heman mijarê, Hisên wiha lê zêde kir: "Wek gaveke duyemîn dê parçeyên laş ji 4 zarokên din re jî werin leckirin. Xebat a leckirinê li ser gelek qonaxan pêk tê, heta temen dibe 18 salî û wê demê qonaxa dawî ye."
Moro di dawiyê de bang li rêxistinên mirovî kir ku der barê wan zarokan de bi erkên xwe rabin û alîkariya Desteya Karûbarên Civakî bikin da ku projeya xwe ya mirovî berfireh bike.
Li gor bîlançoyên dawî yên Desteya Karûbarên Civakî, li herêma Firatê zêdeyî 20 zarokan hene ku pêwîstiya wan bi dest û lingên çêkirî heye.
***ANHA***

## Li Zapê 2 çalekî hatin lidarxistin

**Navenda Nûçeyan**

**Ji bo bîranîna gerîlayên li Werxelê şehîd bûyîn, li qada Kela Bêdewê ya Zapê li dijî leşkerên Tirk ên dagîrker 2 çalakî hatin lidarxistin.**

Di Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser her du çalekiyên li Zapê daxuyaniyek hat parvekikrin Daxuyanî wiha ye:
"Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Bazên Zagrosê de li herêma Zapê;
8'ê Nîsanê saet di 15:30'î de li Kela Bêdewê li dijî dagirkeran ji 2 baskan ve hêzên me çalakiyeke gerîla ya koordîneyî lidar xistin. Çalakî bi çekên giran hate lidarxistin û hedefên hatin diyarkirin, hatin îmhakirin.
8'ê Nîsanê saet di 19:40'î de hêzên me cara duyemîn li dagirkerên li Kela Bêdewê xistin û hedef hatin îmhakirin.
Herdu çalakiyên ku hêzên me lidarxistin, ji bo bîranîna lehengên me yên nemir hatin kirin ku li Werxelê



bi lehengî şer kirin, dîrok nivîsandin, lê bi çekên kîmyewî şehîd hatin xistin.
8'ê Nîsanê saet di navbera 09:00-18:00 de qada Girê Cûdî ya herêma Zapê ji aliyê qereqolên li ser sînor ve bi obus û balafirên şer hate bombekirin.
8'ê Nîsanê saet di 18:00 de li herêma Avaşînê qada Wexelê bi balafirên şer û ji aliyê qereqolên li ser sînor ve bi obusan hate bombekirin.
9'ê Nîsanê saet di navbera 23:00-00:30'î de li herêma Metînayê helîkopter li ser qada Qaşûrayê ve firiyan. Heman demê derdora gundên Dêşîşê, Seraro û Êdînê û qada Koordîne bi helîkopterên êrişê hatin bombekirin."

## Madeyên pîşesaziyê li lîsteya ambargoya li ser Şêxmeqsûdê zêde bûn

**Firqeya 4'an ya girêdayî hikumeta Şamê ambargoyeke dijwar li ser welatiyên taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê danîne. Li gel wê jî li lîsteya madeyên ambargokirî madeyên destpêkê ku dikevin çêkirina cilûbergan û betariyan hatin zêdekirin. Bi wê re wê bi dehan kargeh û karkerên wan werin rawestandin.**

Ji rêzekiryarên bêserûber ên hikumeta Şamê ji ferzkirina ambargo û qedexekirina derbasbûna madeyan li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê, îro Firqeya 4'an qedexe kir ku madeyên çêkirina cil û bergan û betariyan derbas bibe.
Bi vê yekê dê aboriya li her du taxan rûbirûyî aloziyekê be, gelek pirsgirêk werin afirandin; ji wan jî bêkarî û nedabînkirina pêdiviyên sûkên herêmê.
Nêzî 7 hezar welatî di pîşeya dirûtinê de dixebitin ku li 500 kargehên taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ne. Di wan kargehan de cilên amade tên çêkirin û rêjeyek baş ji sûka Sûriyê re dabîn dikin.
M.X yek ji xwediyên kargehên dirûtinê yê li taxa Şêxmeqsûdê ye ji ajansa me re wiha axivî: "Dê bi qutkirina dayîna caw re gelek kargehên çêkirina cilên amade û çente werin girtin. Di encamê de bi hezaran karkger bê kar dimînin û wê bêkarî çêbibe.
Di heman demê de jî bi dehan kargehên taybet bi çêkirina betariyan li herê a Şiqeyêf a Şêxmeqsûdê hene ku xwestekên sûka Sûriyê ji betariyan peyd dikin."
Li aliyekî din jî A.C yek jı kargehên çêkirina betariyan wiha got: "Firqeya 4'an qedexe kir ku madeyên çêkirina betariyan derbasî taxê bibe bi taybet jî qurşîn, li gel wê jî nehişt betariyên çêdikin ji taxê derkevin. Dê bi wê re kargehê rawestin û gelek karker werin



sekinandin."
Firqeya 4'an a girêdayî hikumeta Şamê ji 13'yê vê Adarê ve ambargoyeke tund li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê ferz kir, nahêle ard û sotemenî derbas bibin. Ji wê zêdetir jî madeyên destpêkê yên pîşesaziyan jî qedexe kir derbasî her du taxan bibin.
***ANHA***



# Ji jinên sînemavan yên Îranî biryara yekîtiyê

Li Îranê zêdeyî 300 jinên di qada sînemayê de kedê didin, li dijî tundiya zayendî belavoka hevpar imze kirin û biryar dan ku bi yekîtî tev bigerin.

300 jinên sînemavanên Îranî belgeya "belavoka hevpar a li dijî tundiya zayendî" ya Mala Sînemayê ku li ser mijara di sînemaya Îranê de nîqaşên tundiya zayendî û destdirêjiyê dewam dikin, daxuyaniyek da îmza kirin û rêzek pêşniyar pêşkêş kirin. Zêdetirî 300 jinên sînemakar ên Îranî bi bîr tînin ku ew hîn jî parastina pêwîstiya darizandina sûcan dikin.
Sînemagerên jin ên Îranî ku diyar dikin, divê Mala Sînemayê îdiayên tundiya zayendî û destdirêjiyê lêkolîn bike û bişopîne, dema di vê mijarê de balê dikişîne ser pêwîstiya saziyeke serbixwe ya têkiliyên navxweyî di heman deme de rêxistinek ku ji pisporên di warên hiqûq, derûnî, zayendiya civakî, çavkaniyên mirovî û tundiya zayendî pêk tê pêşniyar dikin.

### Pêşniyar û gavên şênber

Divê saziya ku bê avakirin, ji têkiliyên aîdiyetê yên di sînemaya Îranê de serbixwe tevbigere, hemû sînemageran li ser mijara tundiya zayendî perwerde bike, tenê ji jinan pêk were, bi dengdana komî û demokratîk bixebite û tê xwestin ku ev sazî bibe saziyek ku di qada sînemayê de ji bo bi kar anîna hemû jinan vekirî be.

### Ji bo "dubarekirina prosedûrên bêberheman" destûr nedin

Sînemagerên jin ên Îranî di



daxuyaniya Mala Sînemayê de bi bîr tînin ku tişta ku wekî "çareseriyê" tê pêşkêşkirin, dûrî çareseriya pirsgirêkên ku hatine jiyîn e. Jinên ku belavoka hevpar îmze kirin, heman demê destnîşan kirin ku çareseriya pratîk û exleqa pîşeyî girîng e, ew ê bi vê perspektîfê tevbigerin û li dijî dubarekirina prosedûr ên bêberhem biseknin.
***JINNEWS***

## Tûrneya Ewropa ya Don Kîxot ji Berlînê dest pê kir

**Tûrneya Ewropa ya Don Kîxot ji Berlînê destpê kir. Ji lîstikvanan Berfîn Emektar diyar kir ku şovalyeyên Kurd yên vê serdemê, jinên Kurd in.**

Şanoya Bajêr a Amedê, berhema bêhempa ya Cervantes Saavedra Don Kîşot kir Kurdî û bi navê Don Kîxot dest bi tûrneya Ewropayê kir.
Di çarçoveya tûrneyê de 9'ê Nîsanê lîstika Don Kîxot li Şanoya Gorkî ya Berlînê hate nîşandan û gelekî hate hezkirin. Di destpêka lîstikê de dema ku sonda destpêkirina şovalyetiyê hate xwarin strana 'Ez Xelef im' hate gotin. Piştre jî stranên 'Lawikê Metînî, Bavê Fexriya, Mîro' hatin gotin. Temaşevanên Kurd, Tirk û Elman bi baldarî lê temaşe kirin.
Di lîstika Don Kîxot de Ozcan Ateş, Şahabettîn Dag, Berfîn Emektar, Dîcle Guneş Yavûz, Ozkan Şeker û Şîlan Alagoz hunera xwe pêşkêş dikin.
Şahabettîn Dag bi karakterê Sanço Panza rabû. Sanço yê zikmezin û fêlbaz, bi giranî sist e û ji aliyê xwarin û vexwarinê ve kes bi qasî wî nîne. Başiya Don Kîşot dixwaze, lê carna ji ber rewşên neyînî yên ku Don Kîxot dixe navê, poşman dibe.
Lîstikvan Ozcan Ateş jî di lîstikê de bi karakterê Don Kîxot radibe. Ozcan Ateş bi çanda Amedê û karakterê Don Kîxot digihîne hev û bi performansa xwe gelekî bal kişand.
Ji lîstikvanên Don Kîxot Berfîn Emektar jî dema ku lîstikê şîrove dike, dibêje ku Don Kîxot ên vê serdemê jinên Kurd e.
Lîstika Don Kîxot di çarçoveya tûrneya xwe ya Ewropayê de 10'ê Nîsanê li Hambûrgê, 12'ê Nîsanê lîst, li Essenê, 14'ê Nîsanê li Kolnê, 15'ê Nîsanê li Frankfûrtê, 16'ê Nîsanê li Antwerpenê û 17'ê Nîsanê jî wê li Amsterdamê bê pêşandan.
***ANF***



## Li taxa Xezalî ya Hewlêrê destrengîniya Dilfîroz`ê

**Dilfîroz li taxa Xezalî ya Hewlêrê destrengîniya xwe nîşan dide û ciwanên tên taxê eleqeyeke mezin nîşanî berhemên wê didin..**

Li herêma Başûrê Kurdistanê her ku diçe destrengîniya jinan di festîfal û hefteyên bazarên hunerî de tê dîtin û rastî eleqeyek mezin tên. Li taxa Xezalîya bajarê Hewlêrê Dilfîroz Eyub jî hewil dide bi rêya nîşandana berhemên xwe yên ciwan çanda destrengiyê bide nasîn. Dilfîroz Eyub dibistana amadeyî temam kiriye, ji ber sedemên taybet nekarî xwendina xwe bi domîne û niha jî li di nava bazarê de berhemên karê destê xwe nîşan dide.
Dilfîroz li gel komek jin bi hev re karê dest çêdike û bi jêhatîbûna xwe xemla li ser cil û bergên Kurdî çêdike wiha behsa karê xwe dike: "Gelek heskirina min karê dest re heye, min ez niha li gel komekê kar dikim navê koma me jî Sara Gurube, ew berhemên ku em li mal çêdikin tinîn vêderê hem nîşan dikin hem jî di firoşîn. Civak heta niha gelek piştgiriya min kirine û daxwaz ji min dikin ku ez karê xwe hîn mezintir bikim. Ew jinên ku destrengininin dikarên li malê berhemên xwe çêbikin û li cihên bi vî awayî bi firoşin, ji ber ku di vê qadê de karkirin karek gelek pîroze. Daxwaza min ji dayîk û bavan ewe ku piştgiriya keçên xwe bikin, daku bikarin kar bikin."
***JINHA***





**Civak û welatê dînîtî lê ne serbest be, azadî jî lê ne serbest e!**

Sîpan Şînda

Gelo kî ji we dikare bêje ez dikarim azad bijîm? Civakê dest û devê kî ji we girê nedaye û kî ji we dikare tişta ku dilê we bixwaze bike û bêje? Kî ji we dikare tişta di dil û mejiyê xwe de bi dilekî rehet bêje û bike? Na, ti kes ji we nikare. Ew zirav bi we kesê re nîne! Hûn hemû jî tirsonek in! Mixabin di vî warî de ti kes ji we ne beranê dugurçik e. Heta ku hûn tişteka di dilê xwe de bixwazin bêjin, deh xwêdan we digirin û deh jî we berdidin. Bila ti kes ji we zirta neke û nebêje tişta ku ez bixwazim ez dikarim di nava civakê de bêjim. Lê mereq nekin, tovê mêran ne kor e û hinek hene ku tişta dilê wan bixwaze dibêjin û ti tirsa wan jî ji ti kesî nîne. Ew ne pêstûriya civakê nas dikin û ne jî civak û irf û edetên civakê di xema wan de ye. Ew jî "dîn"in. Heke di nava civakê de hinek bêjin em azad in û em azad dijîn, ew jî kesên ji aliyê civakê ve bi navê "dîn" hatine binavkirin in. Ji xeynî wan ti kes nikare bêje min hemû dîwarên stûr yên ji aliyê civakê ve hatîn danîn hilweşandine û kirasê şermê ji ber xwe kiriye.

Belê "dînîtî", di rastiyê de tê wateya azadiya bêsînor ji bo dînan. Ew ne di mejiyê xwe de ji xwe re ti zindanan çêdikin û ne jî ti qerdiyanan datînin ber derê wê zîndanê. Ew ne di xema ti mal û milkan de ne. Ji ber ku mal û milk, maldarî mirovî bi xwe ve girê dide û mirovî ji azadiyê dûr dixin. Dînîtî vê yekê qebûl nake. Ti dîn naxwazin bibin girêdayî ti erd, cih û warî. Ji wan re kû der xar e ew der war e. Ew dixwazin her tim jiyana xwe ya sivik, hêsanî û ji rêzê bijîn. Hema pariyek nan hebe ji bo wan bes e. Ew ne li pey xwarinên xweş û qesr û qonaxan in. Cil û bergên herî biha û spehî ji qet ne di xema wan de ne. Lê belê azadiya wan di xema wan de ye. Dema yek ji wan re dibêje, 'tu vê tiştê nakî' ew bi hêrs dikevin û awirên wan tûj dibin. Hecko ew kerr û lal ji nebihîstî ve têne û tişta dilê wan dixwaze wê dikin. Gelek caran pirrê we aciz dibin û dixwazin xeber û dijûnan bidin. Lê mixabin hûn nikarin, ji ber ku we civak ji xwe re kiriye zîndan. Yan jî gelek caran hûn tengav dibin û dixwazin destava xwe bikin, lê belê hûn li cihakî guncaw digerin da ku hûn destava xwe xweş bikin. Lê belê yekî dîn dema dilê wî bixwaze xeber û dijûnan jî dide û dema tengavî destavê ji bî, çi dera bivê destava xwe jî xweş dike. Ji bo wan her der azadî ye û ew ti qeyd û bendan li jiyana xwe nadine.

Dînîtî jiyaneke xas e. Bê hîle û pîle, bê dek û dolab, bê fen û fîtne ye. Çi qirêjî û gemar di mejî û giyanê dînan de nîne. Heke qirêjek yan ji gemarek bi wan re hebe, ew jî ya bi cilên wan yên bi mehan ji ber xwe nakrine û nehatîne şûştin ve ye. Lê mixabin di nava civakê de gelek kes wê "dînîtî" (xasî) ya wan ji wan re dikin eyb û heqaretan li wan dikin. Ya rast ez bi xwe gelek caran dihesidim wê jiyana wan ya xas û paqij. Ji ber wê ez dibêjim bila li welatê min dînîtî serbest be lo!

# `Çanda parastina jîngehê ji zarokan dest pê dike`

**Bi armanca xurtkirina çanda parastina jîngehê, parastina daran û xwedîderketina li wan, Desteya Rêveberiya Xwecihî û Ekolojî ya herêma Cizîrê, destpêka Heyva Nîsanê li dibistanên seretayî yên bajarê Qamişlo dest bi pêngava `Hevalên Jîngehê` kir.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Desteya Rêveberiya Xwecihî û Ekolojî ji bo ku wateya parastina jîngehê û giringiya parastina paqijiya giştî bi zarokan bide fêmkirin ev pêngavî pêk anî. Desteyê her rojê serdana dibistaneke seretayî dike û semînerên têkildarî girîngiya paqijiye, parastina jîngehê, çandina daran û dûrketina ji kiryarên xerab dide. Yek ji dibistanên ku desteyê serlêdan kiriye Ibrahîm Henano ye.



Têkildarî giringiya pêngavê û armanca wê, herwiha fayda pêngavê li xwendekaran, cîgira Hevserokê Rêveberiya xwecihî û Ekolojî ya herêma Cizîrê Bêrîvan Omer, berdevka dibistana Ibrahîm Henano Ronak Şêxo û xwendekarê dibistanê Besam Idrîs nêrînên xwe anîn ziman.

**`Armanc avakirina hişmendiyeke durist e`**

Cîgira Desteya Rêveberiya Xwecihî û Ekolojî ya Herêma Cizîrê Bêrîvan Omer da zanîn ku armanca wan ji pêngavê, avakirina hişmendiyeke dirust e û axaftina xwe wiha domand: "Ji ber ku çanda paqijiyê û parastina jîngehê di nava civakê de ne pêşketî ye, me pêwîstî bi pêngavên wisa dît. Me xwest ku vê pêngavê ji zarokan dest pê bikin, çimkî em di vê baweriyê de ne ku çand ji zaroktî dest pê dike. Ji bo wê jî me berê xwe da dibistanên seretayî. Da ku em çanda parastina jîngehê bi wan bidin naskirin û hişmendiyeke baş di wan de ava bikin."

Bêrîvan Omer behsa şêwazê pêkanîna pêngavê kir û wiha got: "Dema em derbaî dibistanê dibin destpêkê semîner li ser wateya parastina jînngehê û parastina çandina daran didin. Em nêrînên xwendekaran li ser paqijiyê digrin, herwiha ji wan re didin xuyakirin ku dar çi sudê dide mirovan û li ser parastina paqijiya giştî ji wan re diaxivin. Em bîdonên çopê, du konteynir û deh daran didin her dibistanê û pênûsên rengîn li xwendekaran belav dikin. Pişt re em û xwendekaran bi hev re daran li dibistanê diçînin, da ku fêrî şêwazê çandina darê bibin û li wan



xwedî derkevin."

Cîgira Hevserokê Rêveberiya Xwecihî û Ekelojî li herêma Cizîrê Berîvan Omer di dawiye de bang li malbatên xwen-



dekaran û mamosteyan kir ku zarokên xwe fêrî rêyên parastina jîngehê bikin, ji ber ku guhertin ji zarokan dest pê dike.

**`Zarok wateya parastina jîngehê nas nakin`**

Berdevka dibistana Ibrahîm Henano Ronak Şêxo da xuyakirin ku pêngavên wisa ji bo xwendekaran pir girîng in û wiha axivî: "Her demê pêwîstiya xwendekar bi pêngavên wisa heye. Çimkî hem faydê li tenduristiya zarokan dike hem jî fikrê wan diguherîne. Zarok wateya paqijî û parastina çandiniyê nas nakin, lê dema pêngavên bi vî rengî û semînerên derbarê paqijiyê ji wan re bên dayîn wateya jîngehê nas dikin. Wê demê zarok ne li dibistanê tenê li mala xwe û li her deverê parastina jêngeha xwe dike. Gelek caran li dibistanê jî hin xwendekar dema xwerekan dixwin çopa xwe diavêjin erdê. Ji bo wê jî pêngav û perwerdeyên bi vî rengî ji bo paşroja xwendekaran pir başin."

Ronak Şêxo axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bihêvîme ku ev pêngav li tevayiya dibistanan pêk were da ku ev çand di nava her kesî de belav bibe û di demên pêş de jîngeh xweştir bibe."



**`Paqijiya derdorê bikin û daran nekujin`**

Xwendekarê bi navê Besam Idrîs ku di refa şeşan de dixwîne da zanîn ku wan sûdê pir ji vê pêngavê girt û hê zêdetir wateya jîngehê û faydeya çandina daran nas kirin. Heriwha daxwaz ji hevalên xwe kir ku parastina paqijiya derdorê bikin û daran nekujin.

# 'Bê hevkariya civakê, pêngava paqijiyê nagihe armanca xwe'

**Kesên beşdarî pêngava paqijiyê ya TEV-DEM`ê bûyîn, banga tevlêbûn û hevkariyê kirin da bigihin encama ku dixwazin ji bo çanda paqijiya giştî di nava civakê de belav bibe û jîngeheke paqij ava bibe.**



TEV-DEM`ê di 28`ê Adara borî de û bi dirûşma "Paqijiya bajar ji paqijiya civakê ye" dest bi hemleya paqijiyê kir. Hemle li Qamişlo, Hesekê û heta navçeya Tirbespiyê dest pê kir.

Bi dehan welatî, endamên komînan, meclis, Kongra Star, meclisa malbatên şehîdan, Hêzên Ewlekariya Hundirîn û şaredariyên gel tev li hemleyê bûne.

Li gorî berpirsên hemleya paqijiyê li bajarê Hesekê ku armanca wan xurtkirina çanda paqijiyê di nava civakê de ye. Hevserokê Nivîsgeha Rêxistinî ya TEV-DEM`ê ya kantona Hesekê Ferhan Daûd destnîşan kir ku hişyarkirina civakê erkeke û wiha axivî: "Ji ber komkirina çopê û avêtina wê bi awayekî bêserûber li bajarê me gemar heye. Ji ber vê yekê jî hemleyên bi vî awayî girîng in."

Daûd diyar kir ku ew bi hemû rêbazan hewl didin ku diyardiya parastina paqijiya giştî di nava welatiyan de belavkirî be û ew jî ji bo bajar paqij û xweşik bimînin her wiha bighêjin jîngeheke paqij.

Endamê Koordînasyona TEV-DEM`ê Ayid Îbrahîm jî têkildarî hemleyê wiha gotinû: "Hemle



dê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê were lidarxistin. Dema zanabeûna civakê dighêje çanda paqijiyê, wê demê dê parastina hebûna xwe bi awayekî tendurist û dûrî nexweşiyan bike. Ji ber vê yekê jî me xwest bi rihê Buharê em dest bi vê hemleyê bikin û parastina xweza û paqijiyê bikin."

Li gorî berpirsên hemleyê, hemle dê mehekê dewam bike û dibe ku were dirêjkirin.

Werşeyên şaredariya gel, xebatkarên paqijiyê ku tev li hemleyên paqijiyê bûne karên xwe di paqijkirina bajar û taxan de bi awayekî rojane didomîne.



Hevserokê Şaredariya Gel a Hesekê Nebîl Şêx diyar kir ku xebat û stratejiya ku şaredariya gel li gorî wê dixebite, parastina paqijiyê ye ku ev yek bi awayekî rojane, heftane û mehan were kirin her wiha îşaret bi beşdarbûna di hemleya paqijiyê de û pêşkêşkirina destekdayîna pêwîst, kir.

Rêveberên hemleya paqijiyê banga girîngiya beşdarbûna hemû welatiyan kir û diyar kir ku bêyî hevkariya civakê dê hemle negihêje armancên xwe.

***ANHA***

# Li gundewarê Dêrazorê saetên dayîna kehrebeyê hatin zêdekirin

**Komîteya Enerjî û Pêwendiyê ya Meclisa Sivîl ya Dêrazorê saetên dayîna kehrebeyê ji gundewaran re zêde kir.**

Komîteya Enerjî û Pêwendiyê ya Meclisa Sivîl a Dêrazorê bi armanca zêdebûna para herêmê ji kehrebeyê gelek civîn lidar xist. Beriya wê 5 mîgawat kehrebe werdigirt û piştî koorîneya bi Rêveberiya Bendava Firatê û Komîteya Enerjî û Pêwendiyê ya Reqayê re, rêjeya dayîna



kehrebeyê hate zêdekirin û bû 10 mîgawat.

Di vê çarçoveyê de berpirsê xetên kehrebeyê yên li Dêrazorê Hafiz El-Beşar wiha axivî: "Me gelek civîn lidar xist heta ku me 4 xet ji stasyona veguherandina Mîlac a gundewarên rojavayê Dêrazorê ji xetên kehrebeya



Reqayê qut kir da ku para wê bi giştî bighêje me."

El-Beşar wiha domand: "Beriya wê para me ya kehrebeyê 5 mîgawat bû. Niha bû 10 mîgawat. Me li gorî pêwîstiyê kehrebe belav kir. Xetên ximzetguzarî ji 13 – 14 saeta ji kehrebeyê di nava 24 saetan de tê dayîn û xetên ronîkirina malan mîna xeta Mihêmediyê, xeta bajarokê El-Cezra, xeta Şaredariyê û xeta El-Ezba ji 8 – 10 saetan rojane tê dayîn."

Her wiha komîte dixebite da ku kehrebeyê li gundewarên rojava û rojhilatê Dêrazorê zêde bike da zextê ji ser stasyonên kehrebeyê kêm bike û para stasyonên avê jî zêde bike.

***ANHA***



# `Dayîka Uweyş bi anîna dinyayê û perwedekirina Rêber Apo dîrokeke nû vejand`

**Fatima Ebdullah: Dayîka Uweyş fêrgeha yekê ya Rêberê Apo bû. Bi anîna dinyayê û perwerdekirina Rêbertiyê dîroka gelên bindest jinûve vejand.**

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Dayîka Uweyş kî ye?...**

Uweyş Ocalan sala 1918`an li gundê Amara yê Navçeya Xelfetî ya Rihayê ji bavekî Kurd û dayîkeke Tirkman tê dinyayê. Di temenê xwe yê piçûk de mêr dike, lê hevjînê wê dimire û pişt re bi Omer Ocalan re dizewice. Dayîka 9 zarokan e, yek ji wan Rêber Apo ye. Dayîka Uweyş di temenê 75 salî de 11`yê Nîsana 1993`yan ji ber nexweşiya dil koça dawî dike.

**`Diya min xwedawend bû, şerker, wêrek û tofaneke serîrakirinê bû`**

Rêber Apo di kesayeta Dayîkê Uweyş de kesayeta jinê analîz dike û taybetiyên Dayîka Uweyş wiha pênase dike: "Ew dayîkeke xwedawend e. Wate dida jiyana me, bê wê em windayî bûn. Hestê hêzê li cem min ava dikir. Wiha digot: `Çi dibe bila bibe, divê mirov xwedîbersiv be, serî daneyne û tola xwe bistîne. Lewra serîdanînê ti carî napejirîne. Hest



û hêzek wisa li cem min ava kir ku ez dikarim şerên mezin bikim û qiyametê rakim. Dayîka min şerkereke bihêrs binavûdeng, wêrek û tofan serîrakirnê bû."

Rêberî di serpêhatiya Miho-Çemo de ku hem temenê wan ji yê Rêbertiyê mezintir e, hem jimara wan pirtir e û ji aliyê wan lêdan xwaribû, helwesta dayîkê Uweyş di wê serpêhatiyê de wiha tîne ziman: "Neyê li cem negirî. Biçe tola xwe bistîne."

Ji ber wê Rêber Apo di wî temenê piçûk de diçe tola xwe destîne. Rêbertî di keseyeta dayîka xwe de hem fêrî tolstandinê, hem fêrî xweparstinê dibe.

**`Dayîka Uweyş dîrok vejand`**

Di salavegera 29`an ya koça dawî ya Dayîka Uweyş de Mamoste Fatima Ebdullah li ser kesayeta daîkê Uweyş û rola dayîkan di avakirina mirov de ji me re axivî.

Fatima destpêkê di salvegera 29`an ya koça dawî ya Dayîka Uweyş de, kesyaeta wê dayîkê û tevayiya dayîkên berxwedêr bi rêzdarî bîr anîn û axafina xwe wiha domand: "Di bîranîna kesayeta Dayîka Uweyş de em berxwedana tevayiya dayîkan



bihelwest û jinên têkoşer silav dikin. Bi rastî Dayîka Uweyş bi welidandin û perwerdekirina Rêberê Gelan, Rêber Apo qonaxeke nû ya dîrokê da destpêkirin. Roleke girîng û bingehî di avakirin û perwerdekirina kesayeta Rêber Apo de, lîst. Lewra Dayîka Uweyş dibistan û fêrgeha yekê ya Rêberê ku tevlî di nava çar dîwaran de dorpêçkiriye, lê hê rola xwe wek Rêberê gel û civakan dilîze. Bi milyonan mirovên bindest û azadîxwaz ji hizir û ramanên wî sûdê digirin û li ser felsefeya wî jiyana xwe didin meşandin. Ji ber wê Dayîkê Uweyş di dîrokê de bû Kaniya vejînê."

**`Dayîk kaniya zanîn û rastyê ye`**

Herwiha li ser wate û rola dayîkan Mamoste Fatima ev nirxandin kir: "Avakirina mirovên rast û durist bi riya hişmendiya dayîkê û çîrok, hastên wê yên rast û afrîner tê kirin. Ji ber wê niha rûniştandina bi dayîkên bihelwest re perwerdeya herî mezin û ya bisûd e. Lewra dayîk kaniyên zanîn û rastiyê ne. Ji ber wê divê dayîk mîna dayîkê Uweyş zarokên xwe bi hastên welatparêzî, cangorî, serîrakirinê tijî û perwerde bikin. Bi çand û zimanên dayîkên xwe bijîn. Bi perwerde û pêşengiya dayîkan, dîroka ku bi hezarên salan tê windakirin û şerkirin, jinûve tê vejandin."

Mamoste Fatima Ebduleh herwisa bi vê peyamê axaftina xwe qedan: "Ji ber wê banga me ji dayîkan re ew e ku zarok, civak û malbatên xwe li ser bingehên welatparêzî, tolhildan û nasîna dîroka xwe û diyarkirin riya rast ya jiyanê, perwerde bikin. Ez jî wek mamosteyekê vê çanda dayîkan di nava dibistan û civaka xwe de diçînim û belav dikim ."

# Dayîkên Gerîla: Li hemberî siyaseta dijmin û PDK`ê rabin ser piyan

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Dayîkên gerîlayên azadiyê gotin, em siyaseta PDK`ê qebûl nakin û şermezar dikin. Emê pişta zarokên xwe bernedinn. Herwiha divê gelê Kurd bi zarok, jin, mêr, pîr û kalan ve rabe ser xwe`**

**Amadekariya êrişan û avakirina dîwar**

KCK`ê 26`ê Adara bi daxuyaniyeke nivîskî eşkere kir dewleta tirkî ya dagîrker û PDK` bi planeke nû dixwazin êrişî qadên gerîla bikin. KCK`ê tevlîbûn û hevkariya PDK`ê bi dagîrkeran re di êrîşa li dijî gerîla de wek êrîşeke li dijî destkeftiyên başûrê Kurdistanê nirxand û bang li partiyên siyasî kir ku li dijî planên dagîrkeriyê bisekinin û divê gelê Kurd li hemberî van siyasetan hişyar be.

Herwisa ji aliyekî din ve ji destpêka meha Adarê ve hikûmeta kazimî û PDk di navbera Rojava û Şingalê de dîwarekî bi dirêjiyiya 205 KM. ava dikin

**`Kurdistan di mejiyê me de nayê parçekirin`**



Li ser avakirina dîwar û amedakariya êrişan yên ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker û PDK`ê ve dayîka gerîla û endama Kongera Stare Xaliya Necar ji me re axivî.

Xaliya diyar kir ku dijminên gelê Kurd, li Lozanê Kurdistan parçe kirin û di nava gelê Kurd de xwestin sînoran çêkin da wan lewaz bikin û ev nirxandin kir: "Lê di aliyê mejiyê gelê Kurd de nikarîn armanca xwe pêk bînin. Ji ber wê li her parçeyî gelê me li xwe xwedî derket. Em wek dayîkên gerîla jî her tim bi vê hişmendiyê tev digerin. Li ser vî bingehî jî zarokên me li her çar parçeyên Kurdistanê ji bo azadiya gelê Kurd û gelên bindest têdikoşin."

**`Emê li hemberî siaysetên dijmin û PDK`ê piştgiya zarokên xwe bikin`**

Lê hemberî vê têkoşînê dewleta tirkî ya dagîrker êriş dike. Ji aliyekî ve dîwaran lê dike û ji aliyekî din ve li seranserê Kurdistanê êrişên xwe yên hovane bi hevakariya PDK`ê li ser gel û gerîla pêk tîne. Mixabin PDK bi dijminî vê role dilîze, heman siyasetên dijmin li hemberî gelê Kurd dike. Herî dawî rola PDK`ê di avakirina dîwarê di navbera Rojava û Şingalê de û amdekariyên şer û êrişkirina Herêmên Parastinê yên Medyayê derket pêş. Em dizanin ku di vê sedsalê de siyaseteke nû ya dewletan li dijî gelê Kurd tê kirin. Dewletên serdest û NATO dixwazin li Kurdistanê xwe bi cî bikin û Tevgera Azadiyê tine bikin û gelê Kurd qir bikin. Em wek gel, jin û



dayîkên gerîla ji vê re şiyar in û emê ti carî qebûl nekin. Herwisa em wek dayîkên gerîla vê şermezar dikin û bang li gelê Kurd dikin ku li hemberî siyasetên dewleta tirkî ya dagîrker û PDK`ê xwedîhelwest be û serî rake. Emê qet pişta zarokên xwe bernedin.

**`Êdî bes e koletî. Zarok, jin, mêr, pîr û kal rabin ser piyan`**

Li aliyekî din Eyşana Mihemed dayîka du gerîlayên azadiyê Garan Agirî û Murad Tolhildan ji me re axivî û teqez kir ku siyaseta PDK`ê ya herî dawî bi avakirina dîrwar û êrişa ser qadên gerîla ne bi serê xwe dike, dijmin jî dixwaze û ew jî pêk tîne.

Dayîka Eyşanê di dawiya axaftina xwe de bang li gel Kurd kir ku li hemberî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û PDK`ê bi zarok, jin, mêr, pîr û kalan ve rabe ser piyan û axafina xwe wiha qedand: "Gelê Kurd êdî bes e koletî, dayîk û bavên me bi sedê salan di binê vê koletiyê de tên kuştin. Divê gel rabe û PDK li xwe û gelê xwe vegere."

# Dayîka Uweyş li ser gora wê hat bîranîn

**Uweyş Ocalan ya ku dayîka Rêber Abdullah Ocalan e, li ser gora wê hat bîranîn.**

Uveyş Ocalan ya ku dayika rêber Abdullah Ocalan e, di salvegera 29'an ya wefata wê de li ser gora wê hat bîranîn. Bîranîn li goristana Amarayê ya li Xelfetiyê hate kirin. Parlementerên HDP'ê Omer Ocalan û Ayşe Surucu, endamên Însiyatîfa Dayikên Aştiyê û rêveberên HDP'ê Xalfetî û ya Rihayê jî di nav de gelek kes tevlî bîranînê bûn. Parlementera HDP'ê Ayşe Surucu di bîranînê de axivî û got "Wekî dayika Uveyîş hesreta bi hezaran dayikan, zarokên wan bû. Di şexsê dayika Uveyş de em bi hezaran dayikên xwe bi bîr tînin. Dayika Uveyş berxwedêr bû tu carî stûyê xwe xwar nekir. Vê sekna wê herî zêde bandor li kurê wê rêzdar Abdullah Ocalan kir. Rêzdar Abdullah Ocalan got 'Heta ku jin azad nebe, civak azad nabe' vê helwestê hêz da jinan. Jin êdî li her qada civakê pêşengtiyê dikin.Jinan li Rojava şoreş kirin. Ev tişt bi saya bandora dayika Uveyş a li ser rêzdar Ocalan pêk hat."

Piştî axaftinê jinan qerenfîl danîn ser goristanê û çûn serdana Mehmet Ocalan û Fatma Ocalan ên ku xwişk û birayên rêber Abdullah Ocalan in.

***ANHA***



# Rêveberiya Xweser hêviya gelên Sûriyê ye

Rûken Ehmed: Rêveberiya Xweser projeyeke serkeftî ye. Gelên herêmê tev bi rêxistin kirin, mafê her kesî da û herêmê jî ji êrişan diparêze.

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

Rêveberiya demokratîk civakan ava dike û mirov bi rengekî azad dijîn. Lê rêveberiyên desthilatdar cureyek zextê li ser civakê pêk tînin û civakê ber bi tinekirinê ve dibin.

Dirêjbûna aloziya Sûriyê rûyê tevayî hêz û aliyên bi navê xizmeta gelên Sûriyê xwe nîşan dan û li gorî berjewendiyên xwe alozî bi kar anîn. Di serî de dagîrkeriya tirkî, van dewletan ji bilî wêraniyê tiştek bi xwe re nanîn. Di nava van aloziyan de, projeya Rêveberiya Xweser nimûne bû. Li ser bingehê hevjiyana gelan hat avakirin û bû modela çareseriyê.
Li ser projeya Rêveberiya xweser û girîngiya qebûlkirina wê ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê endama Têkilî û Tifaqên Demokratîk ya Kongra Star Rûken Ehmed ji me re ev nirxanin kir: " Şoreşa bi navê bihara gelan ji Tûnsê dest pê kir û li gelek welatên Ereban belav bû, lê van tevgeran ti guhertin bi xwe re nanîn. Herwiha ti çareseriyên rastî ji pirsgirêkên welatiyan re nehatin dîtin. Gelên ku bi hêviya azadiyê çirûska şoreşê pêxistin, bêhêvî man, tevgera wan ji cewherê xwe hat dûrxistin û şkandin. Ji ber ku ew bê rêxistin bûn, ketin bin bandora dewlêtên herêmê û ti armanc bi dest nexistin. Heman tişt li Sûriyê hat kirin û yên ku qaşo digotin em şoreşger in, bûn çeteyên dagîrkeran."

### Rêveberî gel e û gel jî rêveberî ye

Rûken di dewama axaftina xwe de da zanîn ku Rêveberiya Xweser dikarîbû bi derfetên xwe yên kêm jî di nava şoreşê de civakê li ser piyan bihêle, wekhevî û rengên tevayia gelan di nava xwe de biparêz e û axaftina xwe wiha domand: " Piştî şoreşa 19ê Tîrmehê, herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê di gelek pêvajoyan re derbas bûn. Di tevayî aliyên siyasî, leşkerî û rêxistinî de xwe bi rê ve birin. Pişt re jî sazî hatin avakirin û bi riya wan tevayî beşên civakê hatin birêxistinkirin. Bi avakirina Rêveberiya Xweser re nirxên şoreşê hatin parastin, her wiha rengê azadî û demokrasiyê li seranserî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê hat pêşxistin. Baweriya gelê herêmê hişt ku ev rêveberî şaxên xwe berfireh bike û ji tevayî cîhanê re bibe nimûne."

### Projeya Rêveberiya Xweser xizmeta çareseriyê û hêviyên gelên Sûriyê dike

Rûken diyar kir ku bi saya fikir û ramanên Rêber Apo gelên herêmê xwe bi rêxstin kirin û axaftina xwe wiha dewam kir: "Bi fikir û felsefeya rêber Apo rêxistinkirina gel bû bingeha şoreşa Rojava. Pir gavên girîng ji bo rêxstikirina civakê hatin avêtin, ji malbat û jinê dest pê kir. Ji ber ku jineke azad wê bi xwe re civakeke azad bide avakirin. Heta em karîbin civakeke exlaqî, polîtîk û demokrat ava bikin, pêwîst e kesayeteke azad were avakirin. Rêveberiyê tevayî rêgezên bîrdozî û exlaqî girtin ser xwe û destanên têkoşînê nivîsandine.

Li seranserî herêmên rêveberiyê jî wekhevî, aştî û ewlehî ji gelên herêmê re peyda bû. Lê belê dagirkeriya tirkî û çeteyên wê herêm hedef girtin û êrişên wan li ser herêmê bê navber dewam dikin."


### Hevgirtina gelên herêmê planên dagîrkeriyê têk birin

Rûken bal kişand ser êrişên li dijî Rêveberiya Xweser û hewldanên têkbirina projeya Biratiya Gelan û wiha got: "Ji ber ku projeya Rêveberiya Xweser xizmeta çareseriyê



û hêviyên gelên Sûriyê dike, hêzên dagîrker êrişî wê dikin, dorpêç dikin û planên qirêj bi alîkariya PDKê saz dikin. Lê ji ber baweriya gelên herêmê bi rêveberiyê û yekîtiya wan, tevaya hewldanan vala hatin derxistin û bê encam man."
Endama Têkilî û Tifaqên Demokratîk yê Kongra Star Rûken Ehmed di dawiya axaftina xwe de ji gelên herêmê xwest ku piştgriya Rêveberiya Xweser bikin û axaftina xwe wiha qedand : " Tişta ji gelên herêmê tê xwestin, bi tevayî hêza xwe berxwedanê bikin û li Rêveberiya Xweser xwedî derkevin. Dagîrkeriya tirkî guhertinên demografîk li herêmên dagîrkirî çêdike. Pêwîst e herêmên dagîrkerî rizgar bibin û gel xwedî li xwîna şehîdan derkeve."

## Aştîxwaziya durû ya Dolmabahçe!



**Ahmet AKTAŞ**

Vê durûtiya AKP'ê ya bi navê aştiya li Dolmabahçe ya Stenbolê, çîrokeke dema zaroktiyê tîne bîra mirovan.
Digotin, li axiriya cîhanê. kesên baş wê xerab, yên xerab jî wê baş werin nîşandan. Ew kesên mîna iblis/sixtekar, wê weke gurên ku postê/çermê mihan li xwe kirine; wê xwe weke melaiketan nîşan bidin, ji bo ku civakê bixapînin û ji rêya rast derxin, bixin rêyên şaş. Lê piştî ewqas xerabûnê, wê Mêhdî dakeve erdê û jiyanê xweş û geş bike, êdî gur û mih wê bikarin bi hev re bijîn!
Em vegerin ser mijra serî ya Dolmabahçe.

Çawa ku tê zanîn, li heman mekanê Serokwezîriyê/Serokkomariyê, di ٢٨ê Sibata ٢٠١٥an de, şanda AKP'ê, ji bo aştiya Tirkan û Kurdan, li gel şanda HDP'ê jî li hev rûniştibûn. Herwiha tê zanîn ka ew civîn çawa hat xerakirin ji aliyê R.T.Erdogan ve, çawa lingê xwe li sifra wê civîna aştiyê ya girîng da?
De temaşe bikin li vî dîktatorê şerxwaz, çawa bûye aştîxwaz? Qaşo wê aştiya Rûsya û Ukrayna çêke!
Li kîjan welatî bêhna şer hiltîne, weke qertelê laşxwur, baz dide wî welatî. Ya jî welatê ku zemîna şer lê hebe, bi lez diçe wira û agirê şer pêdixe. Mînakên herî berbiçav Sûriye, Libya, Iraq, Qerebax û niha jî Ukrayna û hwd.
Jixwe êrîşên li ser Kurdistanê bêjimar in û her roj bi zêdekirin berdewam in. Herwiha li kû derê derbê dixwin, hema vedigere tola xwe ji gelê Kurdistanê distîne.
Piştî çend rojan wê dest bi pîrozbahiyên Cejna Zarokan a ٢٣yê Nîsanê bikin. Xwedêgiravî ewqas zarokparêz in, tew zarokên cîhanê jî vedixwînin Tirkiyê ji bo pîrozbahiyê!
Her sal vê durûtî û sixtekariya xwe ya mezin saz dikin. Bi vê çalakiyê, armanca wan; xapandina raya giştiya hundur, hinekî jî rayagiştiya cîhanê ye.
Erê li aliyekî vê sixtekarî û heftrengiyê dikin, li aliyê din jî fermana qirkirinên zarok û jinên Kurdistanê didin. Mînak bi sedan ên weke Ceylan Onkol, Ugur Kaymaz, Dayika Taybet û hwd.hene.
Mînaka sixtekar a xwedîderketina Alan Kurdî jî heye. Ma berpirsiyariya herî mezin ê kuştina mînakên vî zaroyê Kurd jî, bi giştî ne R.Erdogan e?
Ma heta doh, li gel Beşar Esedê ku gunehkar dike, ne bira bûn? Ma nuha jî li Efrînê, Serêkaniyê û bi giştî li Rojava û herêmê hemî, ti roj heye ku çeteyên DAIŞ û cîhadistên R.Erdogan, zarok û jinên Kurdan û pêkhateyan na revînin, nakujin û mal û milkên wan wêran û talan nakin!?
Her wiha di ٢٣ê Nîsana sala çûyî de, xwedêgiravî di cejnan de li gel zarokan mirovhez in jî, belê carek din ev derewa wan aşkere bû! Di şeva ٢٣ê Nîsanê de, piştî çend saetên ku li gel Şêfê xwe yê Emrîkî axivî, bi ٥٠ frokên F١٦- yên cengê û bi dehan helikopter û SIHAyan êrîşî ser şervan û gelê Kurdistanê kir li Başûr! Bila ev jî were zanîn ku peyamek giring a vê şevê jî; ٢٤ê Nîsana qirkirina Ermeniyan bû!
Lêbelê weke di çîrokê de hatiye gotin; gûman nîne ku ev iblîsên qirker ên vê demê, ew ê werin hilweşandin. Ji ber ku gelê Kurdistanê, MÊHDÎYÊ xwe nas kiriye û di ٨ê Adarê, ٢١ê Adarê û ٤ê Nîsanê de, bi baweriya herî xurt hilwesta xwe nîşan da ku bi hemû hêza xwe li gel Rêberê(Mêhdiyê) xwe û pêşengên xwe ne û bi mirin û mayinê ve ew ê li ser şopa wî/wan bimeşe!

# 'Pêngava derxistina navê PKK`ê ji "lîsteya terorê" girêdana gel pê re misoger dike'

**Hiqûqnasê taybet bi qanûna navneteweyî û mirovî da zanîn ku bersivdana gel û destekdayîna bi pêngava komkirina imzeyan re ya ji bo derxistina navê PKK`ê ji "lîsteya terorê" asta girêdana gel bi PKK'ê re misoger dike.**

Insiyatîfa Edaleta Navneteweyî ya ji bo Kurdan di 13`yê Kanûna 2021`ê de dest bi pêngava komkirina imzeyan ji bo derxistina navê PKK`ê ji "lîsteya terorê" kir. Vê hemleyê di nava kurdistanî û dostên wan de deng veda. Zêdetirî hezar kesayet ji zêdetirî 30 dewletên cîhanê beşdarî vê hemleyê bûn, her wiha parlementer, akademisyen, hunermend, siyasetmedar, nivîskar û çalakvan jî tev li hemleyê bûn.
Di heman demê de gel û pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rêya însiyatîfa gelêrî ku di 12`yê Çileyê borî de hate ragihadnin, tev li hemleyê bûn. Gel bi awayekî zêde berê xwe da însiyatîfê. Bi sed hezeran îmze hatin komkirin û hî jî însiyatîfa komkirina îmzeyan didome.
Parêzer û pisporê qanûna navneteweyî û mirovî Mesûd El-Elî diyar kir ku hemleya ku gelê Kurd ji bo derxistina navê PKK`ê ji "lîsteya terorê" daye destpêkirin gaveke rast e û têkildarî destkedayînê bi pêngavê re wiha got: "Hemleyê ji cîhanê re asta hezkirin û girêdana gelê Kurd û gelên dîtir bi PKK'ê re misoger kir."
El-Elî di berdewamiya axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Dewleta Tirk dixwaze doza Kurd bi rêya tawan û hincetan tune bike. Ji wan tawan jî hêzên hegemon navê PKK'ê xist "lîsteya terorê"



ku wê ji qada siyasî, leşkerî û diplomatîk dûr bixe. Lê têkoşîna gel ev plan têk bir."
El-Elî teqez kir ku dewleta Tirk baş dizane ku pêşketin û têkoşîna vê partiyê dê siyaseta wê ya qirêj eşkere bike û wiha pê de çû: "Divê dewleta ku zarokan dikuje, sûcên herî qirêj li dijî sivîlan bi kar tîne têkeve lîsteya terorê. Ew jî ji ber terora ku pêk tîne. Berovajî PKK`ê ye ku ji bo parastina doz û azadiya gelan, dixebite."
Mesûd El-Elî di dawiyê de bal





kişand ser girîngiya vê pêngavê, girîngiya îmzeyên ku hatine komkirin da ku wan pêşkêşî aliyên pêwendîdar bikin ku PKK`ê xistine "lîsteya terorê" û wiha gotina xwe bi dawî kir: "Divê ev îmze ji rêxistina Afaz a taybet bi raya giştî ya navneteweyî ve, ji Wezareta Karên Derve ya Amerîka, Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî YE, dadgeha edaleta navneteweyî û komîteyên mafên mirovan re werin rakirin."
***ANHA***



# Prof Atmîş: Iraq ber bi rewşeke nediyar ve diçe û Tirkiye sûdê jê digire

Profesorê iraqî Dr. Sadiq Atmîş diyar kir ku Iraq ber bi rewşeke nediyar ve diçe û partiyên desthilatdar yên Iraqê çi Ereb û çi Kurd li berjewendiyên neteweyî nafikirin. Herwiha diyar kir ku Tirkiye ji rewşa Iraqê sûdê digire da ku armanca xwe pêk bîne.

Iraqê di rewşeke valahiya destûrî heye. Heta niha partiyên siyasî nikarin serokkomarê hilbijêrin. Sedema vê yekê nakokiyên di navbera "Hevgirtina Rizgariya Welat" ya bi serkêşiya Sedir û hêzên "Çarçoveya Hemahengiyê" de ne. Li ser vê yekê serokkomarê Iraqê Berhem Salih di 9'ê Nîsanê de hişyar da û gotibû, heger aloziya siyasî dewam bike dibe ku welat ber bi rewşeke xeter



ve biçe û hemû windahiyan bibînin.

Profesorê iraqî Sadiq Atmîş di hevdîtinekê li gel ANHA'yê de got: "Pêwîstiya Iraqê bi serhildan û şoreşgeke gel a mezin û bi hêz heye ku bikaribe hemû partiyên desthilatdar yên ku pîroziyên welatiyan binpê kirine, ji hev bixe."

### Hevpeyvîn wiha ye:

Li Iraqê aloziya avakirina hikumeta nû heye. Piştî hilbijartinên parlamantoyê ku di 10'ê Cotmeha 2021'an de hatibûn lidarxistin û ruxmî ragihandina hevbendiya Tevgera Sedir, Mesûd Barzanî û Mihemed Helbûsî ya ji bo avakirina hikumet, lê parlamanto heta niha nikarî serokekî nû yê welat hilbijêre, ji ber ku hejmara qanûnî temam nebûye, nemaze piştî ku hêzên Çarçoveya Hemahengiyê ya Şîe û hevalvendên wê yên ku hejmara wan 126 parlamanter in, civîn boykot kirin. Gelo sedema vê yekê çi ye?
Gelek sedem hene. Yekem: Birêz Sedir helwesta xwe diguhere. Heger îro helwestekê bide wê sibe biguhere. Ev yek ji aliyê gelê Iraqê ve tê zanîn. Hemû pêşniyarên birêz Sedir tenê axaftin in ku civakê Iraqê esas nagire. Ya duyemîn: Rihê welatparêziyê li gel aliyên iraqî yên ku dixwazin serkêşiya proseya siyasî bikin, tuneye. Niha berjwendiyên şexsî û ezezîyet rola aktîv pêk tînin. Ya sêyemîn jî, dijbertiya di navbera tevgerên siyasî de ye, bi taybet nakokiyên di navbera Sedir û Malikî de. Ev dijminahî bandorê li pêkhateya herî mezin a di parlamantoyê de anku mala Şîeyê dike. Mala Şîe niha jihevketî ye û li ser gelek pirsgirêkan li hev nakin.
Sedema çaremîn: Afirandina aloziyan e ku hîna berdewam dike, tu dibêje qey ji bo derxistina van aloziyan plan têne kirin. Ji ber ku ev partî di prosesa siyasî bi bin ketine û gendeleiya wan eşkere bû, bêyî domandina aloziyan nikarin rewşê biparêzin. Jiyana van partiyan li ser domandina aloziyan e. Ev partî dûrî xebata siyaî ne û nikarin ku bi plan vê xebatê bimeşînin. Lihevkirinên ku di navbera wan de têne kirin, ne li gorî bernameyeke siyasî ne, lê belê li ser pirbûna hejmara parlamanteran e da ku bloka piraniyê ava bikin. Ev yek di serî de ehmeqiya siyasî nîşan dide û ya duyemîn nezanbûna wan bi mijarên siyasî yên herî hêsan diyar dike.
Ev tiştên ku me bi bîr xistin bandoreke neyinî li jiyana welatiyan dike û welat ber bi rewşeke ne diyar ve dibe.
Hinek alî teqez dikin ku ji aliyê dewleta Tirkan û Partiya Demokrat ya Kurdistanê ve planên mezin li dijî Iraqê tên kirin. Dewleta Tirkan hewl dide bi desteka vê partiyê qada dagîrkeriya xwe li başûrê Kurdistanê berfireh bike û sûdê ji aloziyên heyî digire da ku hê zêdetir destwerdanê li Iraqê bike. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?
Tirkiyê rewşa Iraqê baş bi kar tîne da ku armancên xwe pêk bîne. Tirkiyê û bi Îran û ajanên Amerîkayê re di nava pêşbaziyê de ye da ku qada siyasî ya Iraqê bikin qada nakokiyên xwe. Li ser vî esasî dewleta Tirk cih û hebûna xwe li Başûrê Kurdistanê bi kar anîn û bi desthilata li wir re li ser lîstina bi herêma Kurdistanê, dagirkirina xaka wê û xirabkirina herêmên sînorî û topbarankirina gundên sînorî li hev kir. Her wiha nuqteyên xwe yên pêşîn li dijî şoreşa Kurdan, bi taybet a Başûr, Rojava û Bakurê Kurdistanê bi kar tîne.
Hevkariya hêzên serdest ên Başûrê Kurdistanê, anku hevkariya Partiya Demokrat a Kurdistanê û hevkariya nerasterast a Yekitiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) bi Tirkiyê re, nîşan dide bê çiqasê partiyên serdest ên Başûrê Kurdistanê tevahî rêgezên neteweyî, rizgariyê û demokrasî bin pê dikin, nîşan dide bê çawa ji bo berjewendiyên xwe bi partiyên navendî re an jî bi Tirkiyê re yanî bi Îranê re siyasetekê di-



kin, lê encamên wê li ser doza kurdî, gel, şoreşgera rizgariya Kurdistanê di ber çavan re derbas nakin.

### Gelo armancên Tirkiyê ji gûrkirina aloziya li Iraqê çi ye û çima li hemberî êrişên wê yên ser xaka Iraqê bêdengî heye?

Armanca Tirkiyê li erdîngariyê berfireh bibe. Aliyên siyasî yên Tirkiyê ev yek piştrast kirin ku armanca wan vegerandina hegemoniya dewleta Osmanî ye. Ji ber vê yekê plan dike ku qadeke berfireh dagir bike, li gorî nêrîna wê bi vê dagirkirinê dikare şoreşên kurdan ên li Bakur û Rojavayê Kurdistanê tune bike û tevahî parçeyên din amade bike da ku dest deyne ser vê herêmê, siyasetên nejadperestî yên Tirkiyê li herêmên Bakurê Kurdistanê bi taybet û herêmên di bin kontrola wê yên li Başûr û Rojavayê Kurdistanê de pêk bîne.
Her wiha armanceke aborî ya Tirkiyê heye, ew e ku hegemoniya xwe ya aborî xurt bike, bi taybet di vê qonaxê de ku Tirkiyê di nava aloziyên aborî û hilweşandina lîreya tirkiyê de ye. Ji ber ku aboriya wê hilweşiya ye. Ev yek dê rê jê re veke da ku sînorê di navbera Başûrê Kurdistanê û Tirkiyê de veke ji bo ku kelûpelên xwe lê bifroşe û Başûrê Kurdistanê û Iraqê bike bazarek ji bo firotina berhemên xwe.

### Partiya Demokrat ya Kurdistanê bi derxistina aloziya bernamzetê serokkomariyê, hewl dide rola YNK'ê lewaz bike. Bi nêrîna we armanca sereke ji vê yekê çi ye û kî destekê dide namzetê PDK'ê û çima?

Nakokiyên Partiya Demokrat a Kurdistanê û Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê vedigerin salên notî yên sedsala borî. Ev nakokî ne li gorî berjewendiyên gelê Kurd e, ji ber ku ev şer li ser destkeftiyên muhtemel ên siyasî û aborî ne. Ji ber vê yekê herdu partî diçin hevkariyê bi dijminên gelê Kurd re dikin. Bê guman hevkariya bi Tirkiyê re dijminatiya li gel, doza kurdî û şoreşa wê ya rizgariyê ye.

### Niha rewşa Iraqê ber bi kû ve diçe?

Tevahî partiyên serdest ên li Iraqê çi Kurd be yan jî Ereb bi berjewendiyên niştimanî nafikirin. Lê amade ne ku dizî û binpêkirinên hurmeta welatiyan bidomînin. Iraqê ber bi rewşeke ne diyar ve diçe. Hîna ev partî serwer in, hîna çekdariya eşîrtî û ya milîstî ku ev partî dimeşînin, hene û belav in.
Ev hemû nîşaneyên tunebûna dewletê û saziyên dewletê ne. Diyardeyên çekdarî ku niha kolanan hikum dikin, her wiha urf û adetên eşîrtî û qebîltî dozgeriya Iraqê kontrol dikin. Ev hemû proseya siyasî bi giştî têk dibe. Heger serhildaneke gel a mezin tunebe wê dawî li vê aloziyê neyê. Şoreşa gel a çekdarî û hêrsa gel ji bo Iraqê hêviya yekane ye. Tevahî gelê Iraqê li bende vê şoreşê ne ku em nizanin wê kengî dest pê bike.

### Li ser jiyana nivîskar sadiq atmiş

Nivîskar Dr. Sadiq Atmiş ji bajarê Şetra yê Iraqê ye, ji sala 1965 heta sala 1968 li Zanîngeha Mûsilê mamostetî kiriye. Di mijara êkolojiya çandinî de bawernameya master û doktora wegirtiye. Her wiha li zanîngeha Albert Ludwig li Almanyayê zanistên îslamî xwendiye. Li Enstîtuya Protestan a ji bo Lêkolînên Olî, Civakî û Perwerdehiyê wek mamoste kar kir û ji bo penaberên Ereb û Misilman wek şêwirmendê hukûmeta parêzgeha Baden-Württemberg a başûr kar kir. Gelek lêkolînên wî bi zimanên erebî û almanî di kovarên zanistî de hene.
***ANHA***

## Şerê hêzên serdest aştî û hekheviyê nayne.

**Zekî BEDRAN**

Di ser şerê Rûsya û Ukrayna re mehek û nîv derbas bû. Şer bû şerê navbera Rûsya û Amerîka-NATO. Îro li gorî gelek derdoran encamek heye. Baweriya giştî ew e ku Pûtîn hesab nekiribû ku wê welatê Ewropa evqasî nêzîkî hev bibin piştgiriya Amerîka bikin. Pûtîn ambargo hesab kiribû. Ji bo wê li gorî xwe doral kom kiribûn. Çawa be wê Ewropa ji bo Ukrayna şer neke. Weke Kirimê wê hinekê bertekê nîşan bidin, ambargoyê pêk bînin. Ukrayna jî wê li ber xwe nede. Ihtimaleke mezin wê Zelenskî bireve, artêş jî wê şer neke. Bi vî awayî wê Pûtîn hêza dewleteke mezin nîşan dabûya. Li Ukrayna wê hukumeteke li gorî Rûsya bihata avakirin. Pûtîn jî wê bibûya lîderekî wisa ku dinyayê serrast dike.
Lêbelê hesab wisa derneket. Zelanskî nereviya. Artêşa Ukrayna belav nebû û teslîm nebû. Welatên Ewropa jî li hemberî Rûsya bûn yek. Rûsya nedixwest NATO li Ewropaya rojhilat xurt bibe. Lê niha NATO li rojhilat pir xurt bû. Amerîka bi hezaran leşkerên xwe li Polonya û welatên din bi cî kirin. Welatên Ewropa ji bo qda leşkerî derê kîsên perayan vekirin.
Rûsya çima ev rewş nedît, yan jî hesabê xwe li gorî wê nekir? Nêrînek heye, tê gotin di şer de destpêkê rastî dimire. Di meydana şer de çi dibe, rastî çi ye em tam nizanin. Di ragihandina welatên Rojava de nûçeyeke ji bo Rûsya baş be nîne. Ragihandina Rûsya jî wisa. Şerekî mezin yê ragihandinê heye. Ji bo wê divê mirov diqet bike. Lê hat dîtin ku artêşa Rûsya tişta hesab dikir bilez encam negirt. Di erdê re êriş kir. Hêzên heway li gelek hedefan xistin. Bi fûzeyan gelek dever roxandin. Lê bi van serkeftin nabe.
Amekîka û Ewropa bilez fûzeyên antîtank û antîbalafir dan Ukrayna. Lêxistina tankan hêsan bû. Balfir jî weke berê nikarin tev bigerin. Leza artêşa Rûsya şkest. Şerekî demdirêj li dijî Rûsya ye. Dixebitin ku Ukrayna ji bo Rûsya bikin taqan. Di qada aborî de jî bûye weke şerê cîhanê. Dixebitin ku Rûsya bihêlin tenê. Rûsya weke hêzeke dagîrker, Ewropa û Amerîka jî weke eniyeke demokratîk nîşan didin. Dibêjin wê bi ambargoyê bîna Rûsya biçike. Ewropî eşkere dibêjin ev şerê Ewropa ye. Serokê konseya Ewropa Ursula Von Leyon diyar kir ku ji bo Ukrayne deh milyar Ewro kom kirine. Serokwezîrî Ingilistanê çû Kievê.
Wisa tê fimkirin ku Rûsya hesabê xwe baş nekirine. Me di nivîsên xwe yên berê de gotibû wê Ukrayna biroxe û gel berdêla wê bidin. Diviya Ukrayna jî vî hesabî bike. Rûsya eşkere digot, divê Ukrana nekeve NATO: Rojavayiyan ne Ukrana xistin NATO, nejî garantî dan Rûsya. Bi eşkere Urkayna weke zadikê davikan li holê hiştin. Hêzeke weke Rûsya jî ku serî li şer da Ewropa tirsand. Zemîn amade kir ku Ewropa xwe bide pişta Amerîka.
Li dinyay wê firotina çekan zêde bibe. Yên qezenc bikin ne gel, wê şirketên kapîtalîst bin. Dinyaya Rojava bixwe jî ji ambargoyê zererê dibîne. Lê aboriya wan dikare li ber xwe bide. Lê aboriya Rûsya wê pirtir zererê bibîne. Borsaya Rûsya girtî ye. Çûnhatina pereyan di destê hêzên Rojava de ye. Destûrê nadin ku Rûsya pereyên xwe bixwe jî bi kar bîne.
Piştî pandemiyê niha jî Ukrayna derket. Gelak derdor dihizirin ka wê piştî Ukrayna çi bibe. Dinyaya em tê de dinyaya pere, berjewendî û hêzê ye. Şerê li Ukrana di navbera Rûsya, Amerîka û Ewropa de dibe. Ev hêz tev jî dixwazin sedestiya xwe belav bikin. Ti kes ji gelan napirse ka çi dixwazin. Derfet nayê dayîn ku gel biryaran bidin. Pere, ragihandin û teknîk di destê wan de ne. Faturayê jî gel didin û kefen jî li wan dikin.
Ti kes nizane ka wê ev şer kengê biqede. Hêzeke we ke Rûsya ket davikan. Niha jî nizane ka wê çawa ji navê derkeve. Faşîstekî weke Erdogan ku li ser Kurdan qirkirinê dike, hesab dike ku wê aştiyê bifiroşe Rûsya. Rûsya niha li hemberî Tirkiyê dengê xwe nake. Berî niha Erdogan SIHA difirotin Ukrayna. Rojhilata Navî di destê van hêzên serdest de ket nava gêrekê û dike nake nikare jê derkeve. Riya herî rast ew e ku gel van bûyeran baş bixwînin û bi xwespartina hêzên xwe yên cewherî xwe bi rêxistin bikin. Bi destê hêzên serdest azadî û demokrasî nay. Yên li azadî û demokrasiyê digerin, divê li cem xwe lê bigerin.